

ROJA NÛ

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Lîbanê: 15 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê: 15 Qemerî.

Diwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqîf Tabet. Telefona Diwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edreşa telg: Bêrût-Rojant.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR DR. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

CENG & SIYASET DEWRAN

EM ÇI DIXWAZIN

Di dinyayê de, da'wa, daxwaz û mirazîne rast û ne rast, heq û ne heq hene.

Dilê mirovan zehf tiştan dixwazin û gelek caran daxwazker bawer dikin ko da'wa wan heq e û yên ko pê qail na bin, neheqiyê li wan dikin. Gelo da'wa me a kurdan çi ye û tê de daxwazîne ne rast hene an ne? Kurdan ev tişt zehf cara dane eqle xwe û neh milyon kurd qail in ko da'wa wan rast û heq e.

Kurd gava karê welatê xwe dinan eqle xwe, qeydeyên heq û medeniyetê, bendên kewneyên navnijadînin inin pêş çavê xwe û li gora wan qeyde û bingehan seh dikin ko daxwaza wan heq e. Ev qeydeyên he, li ser heyîn û hebûn û danîna hikûmetan û gerandina karên wan çi dibêjin? Emê çavê xwe berî her tiştî li destûrên ko miletên pêşveketî, miletên Ewropa û Emerîkayê danîne bigerin. Destûrên mezin û bingehînin yên ko bi pîrsa me ve girêdayî re ev in:

1- Beyana Inqîlaba Frensîzî a mezin li ser heq û kewneyên mirovan.

2- Çarêde Şertên Serekcîmhûrê Emerîkayê Mr. Wilson.

3- Qandûnên civata Miletan

4- Şertên Etlantikê

5- Qeydeyên ko Hikûmeta Sovyetîstanê danîne.

6- Ehdnameyên Navnijadî.

7- Gotarên Serekcîmhûrê û Serekdewletên Hevalbendan.

Li gora ev heft esasên bilind û qedirgiran miletên ko xwediyê erdê xwe ne, divê li gora daxwaza xwe ji xwe re hikûmetekê deynin û karê hikûmeta xwe, bi destê xwe bigerin.

Ziman, xwendegah û dibistan kovar, rojname, kitêbên her miletî serbest in.

Baweriya miletan serbest e, her kes dikare ji xwe re dinê ko jê hez dike bibijêre û kes nikare têkili baweriya kesekî bibe.

Xelk divê di mal û welatê xwe de, bê tîra û bi rahetî rûnin.

Azahî a serbestî bê dewlemendî qe nabe; divê pêşîya miletan de deriyê xebat û pêşveçûnê, deriyên dibistan a xwendegahan, destgeh a febrîqan vekirî bin.

Zaroyên her miletî, divê di dibistan û xwendegahên xwe de, hîfzî zimanê xwe bibin; tu ziman ji ê din ne çêtir e, ji xwe zimanê her mileteki jê re, ji hemî zimanên din girîntir a çêtir tê.

Heqê ne tu miletî ye ko zimanê xwe bi zor û zorkerî ji zaroyên miletên din re bide climandin. Ji xwe gava mileteki dike bi zor zimanê xwe têxe şûna zimanê nekî din, jê qesda vî tu cara ne xeyre, pîsîti û bêbextî ye, zilm û ta'da ye.

BOMBARDIMANÊN GIRAN Û DIJWAR

Londre—1.100 balafirên britanî û emerîkanî, ji nû ve, dirêjî axa Germanîstanê kirine û li bajarê Kil û Esenê û li hêjagehên garîstanên din xistine, û 145 neçîrvanên elemanî avêtine erdê. 60 mekênîyên Hevalbendan, venegeriyane warên xwe.

Londre—Radyoyên Hevalbendan didin zanî ko heke dewletên Belqanê, dev ji tevkariya elemana ber ne dan, bombardimana bajar û hêjagehên di wan, bi awakî hêj xurtir û bê-eman, wê dom bike.

Moskû—Ordiya Sor, niho di erdê Mecarîstan, Çekoslovakya û Romanayê de, şerê elemana dike; di wan erdan de, zehf gund û avahîgeh ketine destê qiwetên sovyetî.

Moskû—Yekîneyên Ordiya Sor Odesa standine.

Londre—Di nav van hefteyên dawîn de qiwetên Hevalbendan 25 noqavên elemanî xerîqandine.

Wesington—Niho Ordiya emerîkanî ji 7.200.000 peyan bihevketî ye.

Wesington—Bi awakî resmî didin zanî ko bombeavêjên Liberatoran şevê çuyî dirêjî girarva Wêkê kirine û bi awakî gelek xurt lêxistine.

Ber bi Serfiraziye ve

Moskû — Leşkerên sovyetî yên hêla Qefqasê, yên ko şerê çîyan-xweş nas kirine, tén eniya rohelet, û ew bikevin êrişa çîyayên Qerpatê.

Londre—Ordiya Sor, dora Odesayê girtiye. Leşkerên eleman û rûmanî yên ko di vê kelatê de ne û barê parastina vê benderê dikeve stoyê wan, çîqas in, ne nas e. Her hal, berevaniya vî garîstanî, karek giran û dijwar e; ji alîkî 9 firqeyên elemanî yên ko di Rastelnayê de, dora wan hatiye girtin; diviya bû bi vî îfî mijûl bibin, û ji aliyan din, dema tengiyê de, valakirina Odesayê û bi gûnda kîqandina leşkerên tê de, li ser rîya behrê, karekî gelek zehmet e.

Heye ko eleman di Odesayê de ji, mîna li Stalingradê, siûda xwe careke din bi ceribînin, lê gelo stêra qedera wan, çi pêş wan bike?

Moskû—Yekîneyên rûsî, ketine axa Çekoslovakayê; û ala çekoslovakî ji nû ve di ser vî axê re pêl dide. Yekîneke çekoslovakî pêşmêriya Ordiya Sor dike.

Londre—Qerargeha emerîkanî a mezin li Ewropayê elam dide: duhî refîne gelek xurt, ji bombeavêjên giran Keleşên Firok û Liberatoran bi hevketî dirêjî hêjagehên axa Germanîstanê kirine û nemale li Oşerlêben û Bernbergê xistine; refîne neçîrvanan ên mezin, ev bombeavêj dihemandin.

DERBÊN REFEN EMERIKANI

Londre—Nizkahlî ve 2.000 balafirên emerîkanî tēkîlî erîşa duhî bûne. Nû—Delhî—Kewte û sedmêrên Hevalbendan ên êrişker, di axa Tîdinê de, gelek caran zor dane Nafalê, û zerer gihandine wê. Di erdê Parelê de, li 25 mil nîro—rohîlatê Imfalê, êrişeke japonî hatiye şkenan din. Di hêla Kohîmayê de, li bakurê Imfalê japon zor didine qiwetên Hevalbendan; li wê jî rewîşa eskerî ne guherîye. Di Birmanya Bakurî de, leşkerên çînî Wakawîng standine, li nevala Mogaungê. Di eniya Arakanê de, û nemaze di nizkî çîyayên Mayuyê de, japon hêj bêtir pê didin erdê.

LONDRE— Di nav pênc rojên dawîn de 8.000 bombeavêj û neçîrvanên Hevalbendan hêjagehên axa elemana bombardiman kirine.

Qeydeyên jorîn, bi awakî zelal, pêşçavan dikin ko daxwazên me li gora hemî qeydeyên danî heq û rast in.

Ma neh milyon kurd çi dixwazin? Qesda wan ev e ko xwediyê erdê xwe bibin û li gora daxwaza xwe hikûmetekê deynin û karên wê hikûmetê bigerin.

Zaroyên kurd bikevin dibistan û xwendegahên kurdî, hîfzî zimanê xwe bibin; bibin xwedî ilm û hîner hêja û bi kêr hatî. Miletê kurd ji bona azahî û serbestiya xwe her fidakariyê kiriyê, mal û canê xwe da ye û ji ber vî yekê jî, bi heyrantî û bi dilekî germ, qedrê mîrxas û camêrên dinyayê digire; yên ko ji bona azahiya welêt û cihanê, ji bona serbestiya hemî miletên mezlûm û heqşkenandî, şerê zalim û zorkeran û bêbextan dikin.

Kurên Frensê, Ingîlistanê, Sovyetîstanê, Emerîkayê û hemî miletên Hevalbendan, çi biçûk, û çi mezin

ev pênc sal in, ji bona dinyayê ke çak xwîna xwe direjtin, ev di dilê me de xwedî cih in xwedî meqameke mezin in, û em dixwazin mîna wan xwîna xwe birjînin û arîkariya wan bikin,

Em minêkar in ko ev fîrset bikeve destê me, û bi vî awayî neh milyon kurd ji minetdariya xwe pêş wan şehîdan rîya azahî û serbestiyê bikin.

Me çavê xwe ber ne daye mal û welatê tu kesî. Heq û kewneyên her miletî, ji bona me miqedes in. Welatên Robelatê navîn, bê saffîkirina pîrsa Kurdîstanê, nikarin bige hin xweştî û kamiraniyê.

Em dixwazin bibin hevalê cîranên xwe, destbirayê cîranên xwe û bi vî awayî bi kêrî nefî û millet û welatê xwe, dinya û axireta xwe û eihanê bîn.

Eve tiştê ko neh milyon kurd dixwazin.

ÇIROKA KURDÎ

Ez te ne ma dikirim

Zilamkî feqîr hebû, rokê kerê xwe hevsar kir û ji xwe re go: ezê herim Mêrdînê ji bona zaroyên xwe hûr û mûra bikirim; gîba serê meydanê, pêrgî sê zilama bû, yekî ji wan her sê zilama ji hevalên xwe re go: bi Xwedê ez niho dikarim kerê vî feqîrî jê bidizm.

Hevalên wî jê re gotin; kuro tu çîlo kerê wî jê bidizî; kerê wî, hevsarkirî, di destê wî de ye; go: ezê kerê wî bidizim, honê bifiroşin, heqê wî bi nivî. Hevalên wî jê re gotin; herebidize!

Wî zilamî hat hevsarê kerê wî feqîrî, ji serê wî derxist û kir serê xwe û kerê feqîrî teslîmî hevalê xwe kir, û meşîya.

Gîhan nav bajarê, xelkê nêrî ko zîla mekî hevsarkirî, bi destê vî feqîrî re ye; pê kenîyan, û gctin: ev tiştê-ke ecêb e, ê feqîr li dû xwe zivîrî go: kuro, ka kerê min; jê re got: ba vo, ez kerê te me. go: nabe, tu insanî, kerê min. niho bi dû min de bû;

jê re got: meseala min dûdirêj e, bawo ez im kerê tel Ê din go heta tu ji min re ne bêjî, ez na dimeşim... Go—bawo, pîrek diya mi heye, kwîre, û ez zilamkî tewtewê me. û mi bi a diya xwe ne dikir; rokê hingî ji min behîç ko go: ya Rebl, tu lawê min mesix bikî, û ez bûm kerêk û tu li ser min dişuxulî.. qey fro dilê diya min bi mîna şewitîye û ez ha time bîra wê, dia kirîye, go: ya Rebl tu lawê min rahet bikî; belkî-yan îşê xerab nema bike; û ez car din bûme insan.

Edî emrê min di destê te de ye, tu çawan bikî ji min re, ez li ber te me.

Rabû, feqîr got, kuro ez gûnehkar bûme, welleh, çîlo îsal pênc salên min, ez li ser insanekî dixebî. fîm, min divê, tu di min bibihurî, li min helal bikî..û here axira te a xeyrê be, tiştên ko diya te bi te re bêje, bi a diya xwe bike. Mêrik çû û feqîr bê kerê xwe hat malê. Jina wî jê re got: Sofî, ka kerê te?

Go:Hurme, welleh em gûnehkarbûn e; îsal pênc salên me, em li ser in sankî diguxilîn, û kerê me insan bû diya wî nîfir lê kirî bû, û bû bû ker.

Welleh, em niho nizanin, çi ciwaba xwe, li ber xwedê bidin. Jina wî ma ecêbmayî û mîna mêrê xwe go: ya Rebl, tu me efiw bikî. Qederê salekê ev feqîr bê ker ma, rojkê ji pîreka xwe re got: ezê herim Mêrdînê, kerekî ji xwe re bikirim; go: here.

Ev feqîr hat Mêrdînê, nêrî ko vaye kerê wî, di destê delalekî de, digêrîne ko bifiroşe.

Qedimî, û devê xwe kir guhê wî û go: ma mi ji te re nego bi a diya xwe bike; wellehî ez ne ma didikirim serê te hişk e, û tu bi a diya xwe na kî; heqê te ye ko tu tim wîlo ker bî.

Hon ji mi re xweş.

BRAHÎME METÎNÎ

PIRA SEHIRDAR

Zilamkî delal hebû; jinek ji xwe re anî, pir jê hez dikir, qedr û qîmetê hev du gelek zanla.

Şeytan di nav wan de dixebite ka wana li ser hevdu xerab bike, ni kare.

Şeytan çû cem Pîrek Sehirdar û jê re got: tu di karî nav vî zilamî û jina wî xira bikî? Go: belê ez dikarim. Go: heke te xera kir, xelatek te yî mezin li min heye.

Pîrê çû dikana mêrê wê, û jê re got: ez dixwazim topek hevrêgim ji bona dostika lawê min.

Mêrik jê re topkî hevrêgim anî heqê wî deh zêrê zer standin. Pîrê hat li mala wî zilamî pîrsî, giha mala wî li deriyê wana xist, jina zilamî bi der ket Go: tu çi dixwazî? Go: ya keça min, Xwedê ji te razî be, tuê bihêlî ezê, li mala we nimêj bikim, çihê nî dîr e, ez ne ma di gehim, herim.

Jinikê jê re got: were, oda ko mêrê wê lê radizê, secade jê re danî û go de nimêj ke. Pîrê bi derwêna nimêj kir, ew topê hevrêgim xist di nav lihêfa di wan û derket çû, xebera jinikê pê tune ye.

Heya êvarê, mêrê wê hat, şîva xwe xwarin, w'adê ko razin, ew top mêrik dî û gelekî qehîrî, ez hevqas ji jina xwe hez dikim, jina min dost û yarê wê hene.

Ban jina xwe kir û jê re go: here mala bavê xwe, mi tu berdaye. Jinik ne ma zane, hewala mêrê wê çî ye.

Jinik bi qehîr û girî, derket ji mala xwe, pîrê li serê zîqaqa wan sekinîye. Nêrî ko jinik derket û digirî jê re got: hewala te çî ye? Jinikê jê re got: mêrê mi ez berdame. Pîrê go: xem na ke, were mala me, sibehê ezê, te û mêrê te pev xweş bikim. Jinikê pê re çû mala wan, lawikê pîrê heye, keçelokî gurî ye, pîrê jinik xist hinduro, û lawê xwe xist hinduro û kir hewar.

Esker pê ve hat û jê re gotin: hewala te çî ye, go: lawkê mi gurî heye, mi bi xwedî kiriyê heya niha, ko mezin bûye, wê hero yekê binê cem xwe û mi bi der dike, mi divê hon li hatê mi bipirsin...! Hikûmetê lawê pîrê û jinik birinê xistin hebsê, xebera jinikê ji tiştî tu ne ye, digirî halê xwe.

Pîrê ji xwe re go: ezê fêar herim wan derxim, û şeytan lê diferice, bê çî dike.

Pîrê çû sükê, hin k nân û helaw kirî û hat ber devê hebsê û ji dergevanê hebsê re got: lawo Xwedê te bihêle,

edqak li min e, mi divê tu bihêll. ezê herim bidim hebsiya... Ê dergevan jê re got: bibihare, xem na ke...

Pîrê çû cem wan, ji jinkê re got: were çerçefa min li xwe ke, û derkeve ber derî, ji dergevan re bêje: mala te ava, mi sedqa xwe da van hebsiya û ezê herim mal. û here mala me heta ko ez bêim, ezê niha xwe xelas bikim.

Jinik derket wilo got û çû mala pîrê, pîrê kir hewar, go: ev çî hikûmet e, ez û lawê min em anîne, xistine hebsê, eyba me çî ye? Hikûmetê hat nêrî ko pîrê û lawê wêna ye, mane ecêb mayî. Mezinê wan ji wan re got: çîma we pîrê û lawê wêna keçelok anîne? Esker ji mezinê xwe re gotin: pîrê li mala xwe kir hewar, em çûn, jinikê û awê wêna me anî hebsê em ne ma zanin, ev çawa çebû; pîrek sehirdar xuya ye. Ji pîrê re go: here mala xwe, hela te, li te kevel...

Pîrê û kurê xwe hatin mal, ji jinikê re got: tu dixwazî ezê te û mêrê te pev xweş bikim; çî pere bite re hene, ko tu bidî min.

Jinikê jê re got: deh zêrê mi hene; ezê bi te dim, ko tu careke din min û mêrê min pev xweş bikî. Pîrê çû cem mêrê wê û girîya, mêrikê lê nêrî ko pîra ko top jê kiriyê ew e; go: çîma tu digirî, go: ya lawê min, ev topê ko mi ji te kirî, lawê min ji min xwesti bû, û mi ji cem te bir û wa'dê limêja mi hat, ez çûm malekê ji vê taxê mi limêj kir, û mi topê xwe li wê derê ji bîra kir, ez nema zanim kîjan mal e, û lawê min ne ma mi dihevine. Gava wilo ev xeber jix zilê re da, go: pîrê mala te ne ava, mi jina xwe, li ser vî topî berda; mêrik gelkî qehîrî, pîrê go lawo, me qehîre, ka topê mi bide mi, îşaleh jina te li kû be, ezê ji te re bînim; belê tu ê heqê min bi dî min. Zilê jê re got: ha ji te re deh zêr heqê te; û ji te re topê te, û jina mi bîne, binêr bê li kû yel Pîrê çû mala xwe û jinikê re go: ka deh zêra û biliv bi mi re ezê te û, mêrê te, pev xweş bikim. Jinikê pê re çû, bir mala wêna pev xweş kirin, pîrê vegeriya mala xwe şeytan lê ma ecêbmayî, tiştê ko pîrê kir.

Pîrê ji şeytan re got: ev ne tiştêkî mezin e, ezê ê meztir bikim; tu ji xwe re, biferice.

Daket sükê, va kerwanek çê xort hene, çel xertê hêjayî ne;

ehlê gunda ne, çel qantir bi wan re hene.

Pîrê ji xwe re got: ev derbek mezin e, ezê di van de bikim. Giha rasta vana û ji wan re got: barê di we çî ye, jê re gotin: barê me fêkî ye, emê daxin sükê bifiroşin. Pîrê ji wan re got: ez jina serekê bajêr im, û barê di we hemî ezê bitenê bikirim. Xortan jê re gotin: baş e Pîrê da pêşîya war a û birin....

Mizgeftikê heye, du deriyê wêna hene, pîrê ji wan re got: ev mala me ye, hon li ber vî derî bisekinin, ezê qantira bibim hewşê, hela xulamê me, barê wan deynin û ezê qantira û heqê barê we, ji we re bînim.

Xorta jê re go; baş e, li ber deriyê mizgeftê rûniştin, pîrê qantir birin hewş mizgeftê û di deriyê din re derxistin; çû qantirê wan li sükê ji xwe re firotin; ew xort man heya nîro, nêrî ko pîrê derneket. Zilamek di wir re hat, ji wan re got: hon li vir çî dikin? go: em li bendê qantirê di xwe ne! Jina serekê bajêr, qantirên me

birize, hîna ne anîne.

Ewî zilamî ji wan re got: ev deriyê mizgeft e, herin li qantirê xwe bipirsin, qantirên di we çûn.

Ewan xortan rabûm, nêrî ko bi rast mizgeft e.

Gelkî qehîrî û bi sükê de çûm, li pîrê digerin. Carekê nêrî, rastî pîrê hatin.

Pîrê girtin, jê re gotin: kanî qantirên di me? Pîrê dibê, mi qantirên we ne dîne.

Go: bila emê herin şerîetê. Çûn cem qadî û miftî. Pîrê ji wan xortan re got: ezê herî we banî kevim, û ifada xwe li cem qadî bidim; pişt re hon herin; çê na he ko em hemî pev re herin.

Xortan jê re gotin: baş e tu here, pişt re emê banî kevin.

Pîrê banî ket jor û digirî, di miqabil qadî û miftî de.


Qadî û miftî nêrî ko pîrê digirî gotin: çî hewala te ye, tu digirî? Pîrê ji wan re got: mêrê min 40, gundî wî hebû û mêrê min mir û mi xulamên di xwe anîne, ko ez bifiroşim, jê re gotin kanî xulamên te, pîrê got: va xulamên min li ber derî ne, çel xortin.

ne qediyaye

MIREKA CIHANE

MIREKA CIHANE MIREKA WENEYEN SER U ASITIVÊ

CENG & BIHINGEH



Çend Fermandarên Hevalbendan.



Ji Bergehên Civanê Tehranê: Serekwezîr, Mr. Çorçil, Serekcimhûr, Mr. Ruzvelt û Serfermandarê Ordîya Sor, Mareşal Stalin.

NEJAD

Nîfşê me tev dizanin ko em kurd in bêdîrew
Îq û kar, zor me hene, xebatê b'keyn roj û şev.
Jiyana pak cema keyn, serbestî ye çola me,
Paqij biblî xûn, goşt aza biblî canê me.
Kurdên delal binêrin, evî cihê ha şîrîn
Li bin nîrê neyara, j'brîna der diçî xûn.
Ser-bi-xo bûn hûn hemî din, ji bijlî qewmê kurda
Rehma mezin ji Xudê ye, Yezdan verêke merda
Menale to ey welat, lro em in rewça te
Xurt, xebatker em in, guh bideyne dengê te.
Jinê dê gort te keyn me nîne hîç çu sistî
Em in çeper ji bo te da to bijlî bi bestî.
Ya hat bo te hewar e, hewara xûnfiroşa
Tixûban dê dirêfnî û dê girîn çasgoşa.
Ilho, to nêçîr bike û zaxê her diyar ke
Da to bi qencî bijlî welatî bê-neyar ke.

Berwarî: 5-2-1944 T. ILHO BÊDVHÎ

LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE

Directeur - Propriétaire: EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 15 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 15 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

KURDISTAN

- VI -

Parmi les puissances du monde, pour quel motif les Kurdes sont ils privés de tout ? Pour quelle raison, en un mot, ont ils été condamnés ? Ils ont conquis par leur courage la cité de la gloire, ils se sont emparés du pays de la noblesse. Chacun de leurs chefs est un Hatem pour la générosité, un Rustem au combat (1). Regarde : depuis le pays des Arabes jusqu'à celui des Géorgiens, les kurdes se tiennent, semblables à une forteresse. Ces Roums et ces Persans se retranchent derrière eux, les Kurdes les entourent des quatre côtés, et les deux partis ont fait de cette nation une cible pour la flèche du destin. On dirait qu'elle est la clé des frontières, elle confient solidement chacun des adversaires, à la manière d'une digue, e' lorsque la mer de Roum et l'Océan de l'Iran se soulèvent et s'agitent, les Kurdes sont tout éclaboussés de sang, ils les séparent comme un promontoire. Générosité, noblesse, bravoure, audace, ardeur, hardiesse tout atteint sa perfection chez le peuple des Kurdes. Ils ne s'en remettent qu'au sabre, à l'effort, au bon droit. Autant ils s'enorgueillissent de leur courage, autant il leur répugne qu'on les oblige. Cette fièreté et cette grandeur d'âme font qu'ils se refusent à accepter toute dette de reconnaissance. C'est pour cela qu'ils sont toujours divisés entre eux, toujours agités par les querelles et par la discorde. Si nous étions d'accord entre nous, nous nous soumettrions les uns aux autres. Roums, Persans nous serviraient tous comme des valets. Nous porterions à leur apogée religion et puissance, nous "acquerrions science et sagesse..."

Nous avons vu par ailleurs, que les premières tentatives conscientes d'unification du Kurdistan datent du début du XIX^e siècle. Enfin, en 1897, parut le premier journal kurde, « Kurdistan ». En 1908, à la faveur de la révolution Jeune Turquie, un groupe d'intellectuels fonda, à Constantinople, le comité « Hêvi ». Cette organisation ne tarda pas à être dissoute. Elle se reconstitua en 1918, sous le nom de Parti national kurde, puis sous celui du Comité de l'Indépendance.

Un représentant, le Général Charif Pacha, fut accrédité auprès des négociateurs de la paix entre les Alliés et la Turquie. Le traité de Sèvres, signé en 1920, reconnut la légitimité des aspirations kurdes. Les articles 62-64 de cet acte diplomatique) Kurdistan : Section

Hatem et Rustem sont deux personnages légendaires, célèbres l'un par sa générosité, l'autre, par sa force et son courage.

III) prévoient en effet la création d'un état kurde indépendant :

« Art. 62. Une Commission siégeant à Constantinople, et composée de trois membres respectivement nommés par les Gouvernements britannique, français et italien, préparera, dans les six mois à dater de la mise en vigueur du présent Traité, l'autonomie locale pour les régions où domine l'élément kurde, situées à l'Est de l'Euphrate, au Sud de la frontière méridionale de l'Arménie, telle qu'elle pourra être déterminée ultérieurement, et au nord de la frontière de la Turquie avec la Syrie et la Mésopotamie, conformément à la description donnée à l'article 27, II-2^o et 3^o. A défaut d'accord unanime sur quelque question, celle-ci sera référée par les membres de la Commission à leurs Gouvernements respectifs. Ce plan devra comporter des garanties complètes pour la protection des Assyro-Chaldéens et autres minorités ethniques ou religieuses dans l'intérieur de ces régions et, dans ce but, une commission comprenant des représentants britannique, français, italien, persan et kurde, visitera les lieux pour examiner et décider quelles rectifications, s'il y a lieu, devraient être faites à la frontière de la Turquie là où, en vertu des dispositions du présent Traité, cette frontière coïncide avec celle de la Perse.

Art. 63. — Le Gouvernement Ottoman s'engage, dès à présent, à accepter et à exécuter les décisions de l'une et de l'autre Commission prévues à l'article 62, dans les trois mois de la notification qui lui en sera faite.

Art 64. — Si, dans le délai d'un an à dater de la mise en vigueur du présent Traité, la population kurde, dans les régions visées à l'article 62, s'adresse au Conseil de la Société des Nations, en démontrant qu'une majorité de la population dans ces régions désire être indépendante de la Turquie et si le Conseil estime alors que cette population est capable de cette indépendance, et s'il recommande de la lui accorder, la Turquie s'engage, dès à présent, à se conformer à cette recommandation et à renoncer à tous droits et titres sur ces régions.

Les détails de cette renonciation seront l'objet d'une convention spéciale entre les Principales Puissances Alliées et la Turquie.

Si la dite renonciation a lieu, et lorsqu'elle aura lieu, aucune objection ne sera élevée par les Principales Puissances alliées à l'entente de l'adhésion volontaire kurde.

à cet Etat kurde indépendant, des Kurdes habitant la partie du Kurdistan comprise jusqu'à présent dans le Vilayet de Mossoul ».

Les dispositions dont on vient de lire l'énoncé demeurèrent lettre morte, l'application du traité ayant été suspendue à la suite des hostilités gréco-turques, durant lesquelles les Kurdes, victimes des intrigues de certaines puissances, jouèrent un rôle de dupes. Les accords de Lausanne, qui remplacèrent, en 1923, ceux de Sèvres, annulèrent cette stipulation, le signataire oriental s'engageant simplement à accorder à tous les habitants de son territoire « pleine et entière protection de leur vie et de leur liberté, sans distinction de naissance, de nationalité, de langue, de race ou de religion (art. 38 de la sect. III)

De violentes protestations furent élevées par les intéressés. Toutes les démarches entreprises étant restées sans résultats, la révolte ne tarda pas à éclater. En 1925, Chaykh Said, à la tête de nombreux partisans, marcha sur Diyar Bekir qu'il faillit prendre. En même temps, des soulèvements locaux se produisaient un peu partout. Le manque d'organisation et l'absence d'un commandement unique causèrent l'échec de l'insurrection. Il fallut néanmoins plusieurs années d'une répression excessivement rigoureuse, pour en venir à bout. En 1930, la lutte se ralluma dans la région de l'Agri Dagg, sous les ordres du Général Ihsan Nouri, qui relevait lui-même d'un comité secret. Après avoir accompli des exploits presque incroyables, les forces kurdes, isolées dans une région inhospitalière, durent cesser la résistance, faute de ravitaillement et se disperser. Les combats continuèrent jusqu'en 1938 dans le massif du Sasoun et dans celui du Dersim.

Les Kurdes d'Iraq furent mieux partagés que leurs autres compatriotes : les Britanniques confèrent, en 1919, l'administration de la région de Suleymanié, à un chef religieux du pays Chaykh Mahmoud, qui joua un rôle important jusqu'en 1931. Il se révolta à plusieurs reprises, et fonda même, en 1923, un état qui n'eut qu'une durée éphémère. A la conclusion du traité anglo-irakien, en 1930, une autonomie culturelle et administrative assez large fut prévue en faveur des Kurdes. Une loi votée le 23 Mai 1931 confirma dans une certaine mesure ces dispositions, reconnaissant au kurde le caractère de langue officielle, dans les écoles et devant les tribunaux, à côté de l'arabe, dans les provinces du Nord. Notons encore que, depuis cette date, une convention tacite s'est établie, qui réserve dans chaque cabinet irakien, au moins un portefeuille à un représentant

POÈME KURDE

L'ENFANT

Quand je suis triste
Pourquoi je cherche un mot
Un sourire, un regard, une pensée,
Pour me consoler ;
Suis-je toujours un enfant
Qui cherche sa maman ?
Voilà la jeunesse et l'orgueil
Qui tombent comme les feuilles
Quand le vent calme du temps
Les effleure.
Oh les grands mots de la terre vide,
Force, gloire, dignité ;
J'ai besoin de l'amitié
J'ai besoin d'une voix chaude
Qui m'apaise
Dans ma détresse
J'ai besoin d'une main amie
L'âge mûr c'est l'apogée
Où on vient
En passant par les champs ravagés
Ou couche la jeunesse
Des flambeaux illuminent
Des parcours lointains
On est loin du matin :
A la veille d'un sommeil éternel
Sonne lourdement le reveil
Quand je suis triste
Pourquoi je cherche un mot
Un sourire, un regard, une pensée
Pour me consoler
Suis-je toujours un enfant
Qui cherche sa maman ?

Les Kurdes d'URSS se virent reconnaître des droits encore plus étendus. Ils formèrent, durant quelques années une république dans le Nakhkitchévan. Ce territoire fut, par la suite, rattaché à l'Arménie Soviétique, mais sans préjudice de son autonomie culturelle et administrative : Erivan est actuellement l'un des foyers intellectuels kurdes les plus importants, et, chaque année, de nombreuses publications en caractères latins y voient le jour.

En Iran, la politique centralisatrice de Reza Chah Pahlavi eut pour conséquence la disparition de toutes les autonomies locales. Certaines tribus furent entièrement déportées ; la plupart des chefs, envoyés en exil ; les autres cherchèrent à se faire oublier. En 1941, seulement, le changement de régime permit aux Kurdes d'obtenir, en fait, sinon en droit, une assez large indépendance politique et administrative.

CONCLUSION

Il ne nous appartient pas d'exprimer une opinion sur l'avenir du Kurdistan, bien des hasards pouvant un jour ou l'autre modifier l'aspect politique de l'Orient. Constatons seulement que les Kurdes, instruits par une histoire douloureuse prennent chaque jour davantage conscience des erreurs qu'ils commirent par le passé. Leurs qualités natives, jointes aux efforts que dépense une élite agissante leur permettent d'espérer de la part des Etats dans lesquels ils vivent, ainsi que de celle des puissances étrangères, plus d'attention et plus de sympathie qu'on ne leur en a accordé jusqu'à présent.

(FIN)

ROBERT SURIEU

STRANA KURDI

DILBER

Lê dilberê, bejna te zirav e, taka vê farûgê, lê Xwedê azane gîa bûye li zozanê jorî, li mêrga Dezertûgê, heger sed û sî sal ji emrê mi here, taliyê ezê serê xwe deynim, ser oxir û felekê, te keçikê, te nezane, wî bêmal, wî gundo, fesado li min...

Lê dilberê, bejna te zirav e, taka vê çekemê, lê Xwedê zane gîa bûye, li zozanê jorî, li mêrga Şemê; heger sed û sî sal ji emrê mi here, taliyê ezê serê xwe deynim, ser oxir û felekê, te nezane, te ecemê, te zarokê, wî bêmal, wî gundo, fesado li min...

Keçikê digotî: gundîno, malîno, ne m'go çî ecêba hatî ser ecêbê; lê Xwedê zane, de lê, dilê mi keçikê; wele nizam, ne ji maliya, ne ji gundiya dil giran bû, berê xwe da welatê xerbiyê... hungîfska destê mi çûye cêbê, gundîno malîno, ezê di bextê we de, me hûnê

bi dî delalê dilê mi kevin, vegirînin, bela bê malê, ezê ramîsanekê bidimê; bi maliya çetin e, li gun diya tim ecêb e, wî bêmal, wî gundo, fesado li min...

Lê dilberê, ne mi go t'ê me re di ber derfê me re, wa bi gero f, bi gundir e lê digêro, cotê memikê mi keçikê mîna du kewê gozel, bi sariya sibehê re li paşilka mi keçikê dikin şereşêro;

Wê gavê t'ê bê mala bavê mi keçikê, xwezika mi wê gavê, kalê bavê mi kor ba, pîra dêka mi kher û gêj ba, wî bêmal, wî gundo, fesado li min...

Destmala destê min qelemçîft bidim destê te mirî te egîlî. Heger Xwedê ne kir mirdadê zîn û te bi qîzanî, bela bikeve biqûnda, piştî çar sala bimîne li ser darê di jinbîftî, wî bêmal, wî gundo, fesado li min l...

Strancivîn: ŞEXÊ EBDILQADIR

GAZIND & HÊVI

Kurdistanê, ez gorî te binim. Te dibînim tu çenda ciwanî. Tu sorgula li nav bakûn, nêrgîza li nav atan î parçexî jî behîştê yî, tu hatî dinyayê. Tu ciwanîra çendî û çend weltan î. Lê tu kevîl destê neyaran, bê xweyî û bê xudan î. Lawên te hemî dirazin; ev jîne qey li wan adet e. Nîştîmaniya ko ez jê dibînim bi Xudê hemî rûmet e. Çip keke xûnê narîjin; ew niwa zora bi qîmet e. Ma çenda e. a di sax in, emê welê li bin dest û stoxwar û nezan bimînin.

Alem hemî dehwa heq û serfirazî yê xo diken. Axayê me genc û mal û zîva xir diken. Zanayên dinyayê di reya keşîf û îxtîraan de zor diken. Melayên me kitêbkên xwe bo nivîştîya vedikin. Gelfî lawan, ev jîn jî me re germ e. An bi camêrî bîjtî, an ev jîn jî me re yekcar ne gerek e. Gelfî gencan, xortên vî welatî, jî we re fîdatî û nîştîmanîjî ferz e. Dîvê hon Kurdistanê bi zûyattî, serfiratî û bilind ken.

DILKULÊ DOSKÎ

SEVOKA HECI

Ji kêfa Qeytana Hemedaniyê, her du ebid ji bîra kirine, hêdfika cewab şandî bûn Mir Mehmûdê Cindî; Qeytana Hemedanî pêş mir Mehmûdê Cindî kiriyê, go: ya Mir Mehmûd, ev Qeytana Hemedanî miqabîl çavê te ye, tu soz û nîsaqê, tu bi min re didî, tu ê gotîna xwe olîni ciyê; ezê bidim te Qeytana Hemedaniyê. Mir Mehmûdê Cindî gava çav a Qeytana Hemedanî ketî bû ge... wê wî hatiyê, go: bi sozê mîrê derê, neger Xwedê miradê min bîkî, ezê te jî mehir bikim bi hewltiyê;

Çiçeka Cindî êdfî Qeytana Hemedanî xist destê wî ye... Mir Mehmûdê Cindî rahîqtî Qeytana Hemedaniyê; hêdî, hêdî dimeşîya berê xwe da dîwanxana bavê Sêvoka Heci, çû nêrî ko meclîsa bavê wêna, jî fêris û pahlawana digeriya, silav li civata hazîra kir li wana dikiriyê; çû li ber destê bavê Sêvoka Heci sekinîyê; hêdfika Qeytana Hemedanî da destê wî ye. Gava çavê bavê Sêvoka Heci bi qeytanê ketiyê, ecêbek gelekî mezin diyê; bavê Sêvoka Heci xwe li qulp û sera daniyê; meclîs êdfî hemî rabûn li ser piyê; jî bavê Sêvoka Heci re gotiyê: ya Mirê me; gotin tê ne maye. Te em kirin şahîd, jî bona Xwedê, ev çîz ma rizqê vî xortiyê...

Bavê Sêvoka Heci nêrî ko rê ne ma jê derê, go: serseran û serçavan, bi vî civatê û bi vî xortiyê; qey Xwedê Teala rizqê wan tev kiri bû û ezmanê joriyê...

Edî bavê Sêvoka Heci şandî

bû, du melê aniyê, mehra Sêvoka Heci û Mir Cindî, bi qewlê pêxemberê Xwedê li hev biriyê... daweta Sêvoka Heci û Mir Cindî qedrê heştêkê li dar daniyê. heya ko rihela «cihêza» wêna tekmlîl kiriyê; aliyek jî qesra xwe jî Mir Mehmûdê Cindî re vala kiriyê. Mir Cindî û Sêvoka Heci ketin wê qesrê, hev du standin, bi helaliyê...

Mir Mehmûdê Cindî jî apê xwe re gotiyê: go ya apo, ez hêvî û recê jî te dikim, tu izna min bidî, ezê berê xwe bidin bajarê bavê xwe.

Mir Cindî kar û barê xwe kiriyê, hati bû derê bajarê sekinî nêrî ko Çiçeka Cindî li hêviya wî ye, gava hati bû silav li Çiçeka Cindî kiriyê; Çiçeka Cindî şandî bû da, sê ebidêna cîna aniyê; rahîqtî bûn Mir Mehmûdê Cindî û Sêvoka Heci, tev li xîş û malê wêna hilanîne bi ezmanê hefta ketine anî bûn nîzîkî bajarê bavê wîna daniyê... Hey lo dîlo, tim lo dîlo, kêfxweşo dîlo...

Mir Mehmûdê Cindî cewab şandî bû dî bavê xwe, bavê wî bi eşq û bi kêf derket pêşîya wî ye, gelekî kêfa wî jî Mir Mehmûdê Cindî re hatiyê û dawetek mezin jê re çekiriyê...

Mir Mehmûdê Cindî soza xwe bi cih aniyê, piştî salekê şandî bû dî Çiçeka Ciniyê mehra xwe li Çiçeka Cindî kiriyê....

Ew gihan miradê xwe, û em jî bigehin miradê xwe bi istîqala Kurdistanê...

PEJINAN DINYAYÊ

Xebat - Fidakari - Serfirazi - Serdesti



Bergeheke delal, şerevaniyine xort û ciwanmêr.



Ji bergelêhen welatê Frensê... Masîvan jî bona masîvaniyê kar û barê xwe dikin.

GEWIL

Qewile Sêxê Hizanê

Hay felekê, hay felekê, Dinya li min wergeriya gemî û kelekê, Li ber min wînda dibû, çavê di belekê. Sêx Sedîq e, bi kerb lez tê Qebûl na ke vê hurîyetê Da'wa şêxa li serferîetê. Çûm Bedîfsê, gelfî bi gelfî Civat gerîya hemû welfî Jê difiriya bû cotik welfî Xeniqandin şêx Sedîq Elî. Çûm Xeydayê, bi şan û şîne Meclîs û urfê li hev du civiyane Li şêx radikirine, ferman e. Xeniqandin şêxê Hizan el Çûm Bedîfsê, wiha li wê ye Dara qetlê li devê rê ye Şêx davêtin feleqê ye. Şerft qetiya jî canibê Xwedê ye. Mirwet ne ma li dinyê ye. Dayika şêxa rabe bilezîne Xurçîka zêra bi xwe re bîne

Bik hedî jî walf re bişîne.

Şêx zaro ye, belkî ne xeniqînîn. Xeniqandin şêx Sehabedîne, Ro di qubê felekê de dimîne Xeniqandin, şêx seneda dîna e.

DÛRIK

Ha Dûrik nayê, nayê Tu keroşka li nav lemayê Tu xezala li ber cemayê Tajî û tola berdayê, Ne girtî û ne gihayê. Tama memkê te xweş in Wek xurmayê Bexdayê. Wek fîsteqê Besrayê. Ez çiçeyî gerîyan li dinyayê Ez çû bûm Hemîs û Hemayê Û ez çûm Kerkûk û Bexdayê Kes temtîla te nayê, Malê dinyê hindik e Qelenê Gewra min nayê. Serê Gewra mi sax be Ez çî bikim jî malê dinyayê.